Ayasofya

Ayasofya (bi yewnanî: Ἁγία Σοφία, *Ayia Sofia*, "Hikmeta Pîroz"), dêreke kevnar a bîzansî ya taxa Eminönü ya Stembolê ye.

Muzeya Ayasofya ya Stembolê, 2013

Avahiya ku wek dêr hatibû lêkirin, heya demekê bû mizgeft û îro wek muzexane tê bikaranîn û li Eminönü, li aliyê ewropî yê Stembolê, hatiye lêkirin. Gava ev qubeya basîlîka di sedsala 6mîn de hate avakirin, weke mînakeke bèhempa ya mîmarî hate dîtin.

Ayasofya ku mînaka herî dawî ya mîmariya antûk e, dêra sereke ya Împeratoriya Bîzansê û navenda olî ya xirîstiyanên ortodoks bû.

Gava Justinian bû împeratorê bîzansî, wî bi lêkirina ew meztirîn avahiya wê demê hêza xwe nîşanî hemû cîhanê da.

Ayasofya ji ber hemû taybetiyên xwe bi dîroka kûr a Împeratoriya Bîzansê ve girêdayî ye, ji ber ku bi lêkirin û hêza wê ya sembolîk xwediyê girîngbûneke bilind bû. Lewra ji aliyê oldarên xirîstiyan ve hê jî wek perestgeheke pîroz tê dîtin.

Di sala 1453an de gava Konstantînopolîs ji aliyê osmanan ve tê fethkirin, çan û gelek xemilandinên xirîstiyan ên Ayasofyayê tên jêbirîn.

Ji ber hêjayiya xwe Ayasofya di sedsalên 16 û 17an de ji Împeratoriya Osmanî re bû mînak ji bo lêkirina mizgeftan. Wek mînak, mizgefta Siltan Ehmed û Mizgefta Şîn kopyeyên Ayasofyayê ne.

Çavkanî

Ji "https://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=Ayasofya&oldid=778916" hatiye standin.

Ev rûpel cara dawî 11 tîrmeh 2020, seet li 16:38an de hatiye guherandin.

Nivîsar di bin lîsansa Creative Commons Attribution-ShareAlike License de derbasdar e; heke tiştên din werin xwestin dikarin lê bên zêdekirin. Ji bo hûragahiyan li Mercên Bikaranînê binêre.